İstratîjiya cihê devera çiyayê Kurdan sebaret miletê Kurd ku dê bibe dergehê Rojavayê Kurdistanê li ser Derya Sipî ya naverast, herwisa di paşerojê de dê bibe dergehê Kurdistana azad li ser Derya Sipî ya naverast, û ev yek giringtirîn armanc e ji layê istratîjî ve, ku dergehê Kurdistana azad li ser derya vebe.
Çiyayê Kurdan ji layê rêveberî ve girêdayî ye parêzgeha Laziqiyê, û di navbera du nahiyan de parve dibe:
١.Nahiya Selma:gelek gund tê de ne, wek: Selma,Dorîn,Kom,Maroniyat û Bisofa.
٢.Nahiya Kenseba: û gundên wê jî pirr in, wek Kenseba, Şilf, Îdo, bille, Ara, Broma, Eko, Nehşeba, Geliyê şêxan, Berze û Kebatê.
Piraniya akenciyên çiyayê Kurdan Kurd in, ji çaxa Selah Eddîn Eyûbî de, li wê deverê nişтecîbûne, hejmara wan kes heye, **200,000** zêdetirî Kurdên çiyayê Kurdan di navbera çar êlên Kurdî ên mezin de parve dibin, êlên Mûşan û Ûcan û Kîxya û Şêxan, piraniya Kurdên wê deverê zimanê dayikê yê Kurdî jibîr kirine û bi zimanê Erebî di-axivin, ew jî bi egera siyaseta Erebkirinê ya ku rêjîma Ba›as a şofînî himberî milletê Kurd li Sûriya dişopand, lê ji layekî dî ve Kurdên devera çiyayê Kurdan nasnameya xwe ya netewî Kurdî jibîr nekirina, û .ta nuha dibêjin em Kurd in
Ji destpêka şoreşa Sûriya ve, şoreşa azadiyê û rûmetê li dijî rêjîma Ba›as, milletê Kurd li devera çiyayê Kurdan beşdarî şoreşê bûn, û dixwestin ku rengê Kurdî di şoreşa wan de diyar bibe, herwisa welatiyekî Kurd ji çiyayê Kurdan daxwaz ji partiyên siyasî Kurdî kiribû, ku hezar bedle (cil) ên pêşmerge ji wan re bihinêrin çiyayê Kurdan, daku bi cilên Kurdî beşdariyê di şoreşê de bikin, çiku daxwaza wan ew e ku nasnameya Kurdî ya çiyayê Kurdan biparêzin.
Bi sedema lawazbûna partiyên siyasî Kurdî li devera çiyayê Kurdan, qelisbûna çalakiyên wan, ji ber siyaseta erebkirinê ya ku rêjîma Ba›as a şofînî li dijî milletê Kurd bikar anî, qedexekirina ziman û rewşenbîrî û nasnameya Kurdî, Kurdên çiyayê Kurdan zimanê dayikê jibîr kirin ji bilî hindek pîremêran ên ku hîn bi zimanê Kurdî di-axivin, lê ewan nasnameya xwe ya Kurdî jibîr nekirine û ta nuha dibêjin em Kurd in, lewra di vê qonaxê de û jiber giringiya devera çiyayê Kurdan sebaret Rojavayê Kurdistanê, û herwisa Kurdistana azad di paşerojê de, divêt partiyên siyasî Kurdî istratîjiyeke nû derbarî çiyayê Kurdan bişopînin, nexasim di warê ziman û rewşenbîriya Kurdî, û herwisa di warê parastinê de, û avakirina bingehên rêkxistinên siyasî Kurdî li wê deverê, daku çiyayê Kurdan û milletê Kurd li wê deverê vegere himbêza xwe ya surîştî, û bibête pirê dan û standina Kurdistana azad bi Cîhanê tev dî re di paşerojê de.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelal!

Dengê Dawî Di Tûrikê Helbesta Kilasîk De Mihemed Elî Hiso Diaxive

- Konê Reş rojekê li ser şehîdan nenivîsand, bo bazirganiyê di hemû warî de dinivîse.

- Serê me bilind devê me li ken...Hate bîra min meşa Nûridîn.

- Evîn derdekî mezin e Dil girtiye ser û bine, ev stran helbesta min e..

- Apo Osman Sebrî bi rojan zarokê wî birçî diman, şoreşger bû.

- Ji Helbesta Nûjen Helbesta Ehmed Huseynî xurt e, ez jê hez dikim.

- Dr.Nûredîn Zaza mêr bû. Zanyar bû, kêmasîk wî hebû nêzî began bû.
- dixwazim rewşenbîr ji min qut nebin, ez dixwînim.

- Şoreş xaniyeke, divê derî û pencerê wê jî hebin.

-Piştî birêz Ocelan dîwana «Nalîn» xwend, biryara çapa hemû berhemên da, lê mixabin....!

Seyda kurte jiyana xwe ji bo xwendevanê «Bûyerpress» re bide nasîn?

Di sala **1930**î de li gundê Mozan ez hatime dinê, ez û xwehek xwe bûn , û ji ber gelekî spehî bû nehiştin ta heft salî ji mal derkeve, navê wê Mecîda bû, xweha min û zarok çûn ser gola avê û di gola avê de fetisî, min ev buyer anî ziman ta ku xemginiya jiyana xwe diyar bikim. Xwendina min di destpê kê de li cem Melle Fethullah, ez her dem diçûm cem Melle û şêxan ta ez bixwînim, di salên şêstî de min dest bi helbestê kir. Piştî xweha min mir ez wehîd mam.

Ez li gundê Topiz **13** salî zewcîm ji ber ez bi tenê bûm, keça pismamê min ji min re anîn, min got ez naxwazim , ez bi çola ketim, gotin divê tu bizewicî, ez xweşik bûm, zarokê min ji xanima min ya pêşî ya ku navê wê Safo bû, du kur û du keçik hebûn, Siltê û Nofa, Ehmed û Ismaîl, ez wehîd bûm û di sala **1956**an de min leşkerî kir ji ber min nezanî bû ku yên wehîd naçin.

We çawa dest bi nivîsandina helbestê kir?

Ez û hevalê xwe Salih bûn, bavê salih gotibû em ê zarokên xwe û jina xwe bikujin ta ku nekevin destê dijminan de û ez miradê xwe li wan bikin, min ji bavê wî re got nabe hûn Kurd hev bikujin, gote min ez Mihemed Elî nadim bi we gişa, bandora vê yekê pir li min hebû.

ez diçûm Şam û Salih li vir dima, wek mirovê dil têkevin hev de, min jê re name bi helbestî dinivîsand, û wî jî bi eynî awayî li min vedigerand, û vê yekê jî bandora xwe li min kir. Min helbest dinivîsandin û diqetandin ta ku min li ser Bor Seîd di sala **56**an de nivîsand, wê demê çend helbestvan li Şamê hebûn mîna Hejar Mukriyanî, pirtûkek xwe da min û diyarî ji min re li ser nivîsandibû, mixabin min nizanîbû xweşik bixwendaya, yekemîn helbest min nivîsand li ser Bor Seîd bû, min ji Nûredîn Zaza, Mukriyanî, Qedrî Can, Cemal Nebez pirsî ku nerîna xwe di helbesta min de bidin.

Di leşkeriyê de bîst leşkerê min kurd hebûn û yek Aşûrî bû, min dersê Kurdî didan wan , min şukrî Quwetlî li Qamişlo dît û pê re axivîm min got: Bijî serokê komara Sûrî ê ku Sûrî ji dagîrkirên Firensî rizgar kir. Dema ku Cemîlê Seyda sirgon kirin Siwêda, Sultan Paşa hefteyekê sax firavîna wan çêkirin û digotin em Kurd in, dûv re em reviyan Beyrûtê ta em neyên Girtin, ji ber dimuqratiya wê pir bû.

Ez hindekî Ji mijarê derdikevim, ez ê vegerim mijara nivîsa helbestê, Ez gelek salan li çolê li ber pez mame, bavê min pezê me nedixist nav tu kesî de, ew jî hişt ku hestên min nazik bibin ji ber ez nêzî siruştê bûm.

Dr Nûridîn Zaza her dem digot: Eger Mihemed Elî Heso binivîse tu kes wek wî di her çar perçeyê Kurdistanê de tune ye. Wê çaxê li Şamê bû, min henek pê kirin û min xwe avêt ser zikê wî, min got min helbetsek pir xweş nivîsiye, li min guhdar be, û min jê re helbesta li ser Berzanî xwend:

(Hatina Berzanî)
Dimuqratî ye lêdan û dijîn
Iştirakî ye lê em tev bi serxwîn
Alîkarî ye, dar û qamçî ye
Li ser û piya me ew jî zanîn
Ji bo hiqûqê Insan ew digrîn
Kanî dibistan kanî pêlweşîn
Diwazdehê Tebaxê sala şêstî
Derew xuya bûn perde tev çirîn
Heyştê mirov Kurd bûn gunehê
me çibûn
Mekteba didwa em girtin anîn
Ji Şam û Heleb, Kaniya Kurda
Li Qamişlokê Dêrik û Efrîn
Berê me dan Şam dest bi kelemçe
Em zincîrkirî ji me ditirsîn
Li derê Mezê şirta dicivîn
Bibûne du rêz li hev dinerîn
Berê xwe didan hev li hev dinerîn
Ferman didan me xeber û dijîn
Me ew qelaştin tena tena çûn
Yeka yek meşîn,
serê me bilind devê me li ken
Hate bîra min meşa Nûridîn
Em **32** zincîrkirî bûn, ez û Osman Sebrî, Reşîd Hemo, şewket Henan, Hesen Osman, Ehmed Menan, Mihemedê Misto û birayê wî, û Ezîz Zaza.
Ê ku lêxistin gelekî xwar ez bûm, navêpêşî ê min bû.

Te ji kê re xwend û çi bandor li te bû ku te helbest nivîsî?

Min ji Cegerxwîn re dixwend em dost û meriv bûn, Cizîrî, Xanî, Tîrêj, Bêbuhar, me tev da dinivîsand, dema ez û Tîrj çûn ligel Melle Fethullah me helbestên xwe jê re xwendin, gote min: Ya te ji ya Tîrêj xurtir e.

Melle Nûrî Hesarî **44** pirtûkên wî hene, tenê **4** ji wan çapkirî ne, Palo jî helbestên wî hebûn. Em hemû bi hev re bûn û me têkilî dikirin.

Çar dîwanên te hene, ji me re li ser naveroka wan dîwan û hebestan biaxive?

Dîwanê min ya yekem Nalîn bû di sala **1999**an de çap bû, min **50** salî helbest nivîsî û dîwana xwe ya yekem di sala **1999**an de çap kir, ew jî ji ber rewşa aborî bû. Derdê Ezîtiyê di sala **2001**ê de bû, ya sisyan Zîlan bû, ya çara Berxwedan bû, û ya dawî li ber çapê ye bê nav e, ez û keça pakrewan Isa Hesso li ser kar dikin.

Dema ku ya yekem ji çapa Nalîn derket, birêz Ocelan piştî dîwana min xwend got çi berhemên Mihemed Eli hebin jê re çap bikin, lê min fikir dikir min ji xwe re digot ma Apo ji min û pirtûkê min re vala ye, lewre min çû ji bêrîka xwe li Dirbêsiyê çap kir.

Binyad wê demê berpirsê Şamê bû got ez erê didim, lê Serhed berpirsê Libnan û Sûrî ye, ez çûm Libnanê Serhed got ez erê dikimi, lê mixabin ê ku li Helebê bû derengî xistê û çap nekir.

Naveroka dîwanên te li ser çi ne bêtir?

Hemû li ser şehîdan û bizav û tevgera kurdî bûn,

Nalîn! Navê dîwana te ya yekemî ne, ew jî navê keça te ye e, pakrewan e. Hinekî li ser Nalîn û helbesta wê biaxive?

Nalîn keçek pir zîrek bû di temenê **4** sal û nîvan de gihişt pola didwan li dibistanê, mamosteyan pir jê hez dikir, piştî bû pola **12** û xelas kir, ez û wê çûn Helebê, min jê re tuxmeke nû kirî û kiriya oda wê jî ya şeş mehan da ta zanîngehê bixwîne , lê wê ji min re got: Ez xwendinê berdewam nakim, divê ez herim serê çiyê, vegeriya Qamişlo , û cihekî taybet girt.

Min navê dîwana xwe kir Nalîn, Ferhad Çelebî got min mercek partiya Pêşverû heye ta çap bike, divê navê Berzanî û Apo tê de tune be, û ji min re çap kirin. Bavê binyad ê bêjer helbesta Nalîn Xwend û got divê ev helbest bi zêr were nivîsandin.

Nalîn
Stêr im diqurujim can xelat im
Perwan e me li dor arê felat im
Karkir im tim li kar im ez roj û şev
Bêhedan im wek Dijle û Ferat im
Ez perî me li her warî diyar im
Dêwe sor im li pozê Arart im
Ez pilinga daristan û çiya me
Ne tenê me ez bi kom û civat im
Ne wek Candark û Cemîla li Cezair
Ez hîn bêtir ji wan zêde du qat im
Qomîtana Gerîla me li Cûdî
Ne mirî me ez şehîda welat im
Li we teng bû hevalno bankin
Hûn xwe bigrin, di hana we de hatim
Dema Berzanî di **56**an de ji Rûsya vegerya min ev helbest bo

vegera wî ya pîroz nivîsî:
«Kaniyên Kurdistan»
Ava sar û zelal derxînin
Nift û benzînê bêtir birjînin
Co û cobara bixuşin, biherikin, bilîlînin
Kew bikin qebeqeb serê xwe hilînin
Çiyayên Kurdistan temenê bigrin
Ji Berzanî re serê xwe bitewînin
Keç û xortên Kurd govenda, dawetan lidar xînin
Keç gulê sor di ber serê xwe de daçikînin
Zarokên Piçûk lek bi lek werin
Piyên xwey xwas, laşê bê kiras veşêrin binixumînin
Bera çav û lêvên we bikenin bixwînin
Bibin şerîbe li ser baskê rê wexta Seyda bê
Pîr û kal dest bi gopal zû bilezînin
Arart û Aras bibin yek hevdu ramîsin wek çakûç û das
Dema hate gotin Berzanî hat
Tirseke mezin kete nav dilê diza dilê xwîn mijan
Beyar û menderîst sêwelek û pîs
Veciniqn man şaş û mat, digotin çawa Berzanî hat
Navê Berzanî wan dirisîne, pişta wan dişkîne
Nava wan diqetîne, qîrê Berzanî wek deqa mizgînê
Wek dîkê sibê kurd şiyar kirin şeva tarî çû

Gelawêj bilind bû, şivek xelat tîrêjên jinê xwe berda welat
Berzanî rabe bê tirs bê pirs em tev bûne kar
Wek destê cotkar wek dilê şiyar
xortên dimuqrat pir kêfa wan hat
dema Berzanî vegeriya welat
Hûn çawa helbesta nûjen dinerxînin.

Ji xwe ya min li ser Berzanî nivîsîbû nûjen e. Helbesta Ehmed Huseynî xurt e, ez jê hez dikim, eger helbestvan nûjen yan kilasîk deyne, baş e lê hindek hene nizanin helbesta nûjen çawa dinivîse, ez ji ya nûjen hez dikim, û min gelek helbest di rojnameya Bûyer de jî xwendine. Ez ji her du cureyan hez dikim, û ez dixwazim her dem nêzîkî warê wêjeyî bim.

Hûn jiyana xwe ya rojane çawe derbas dikin.?

Ez ê di nivîsê de berdewam bim, dixwazim rewşenbîr ji min qut nebin, ez dixwînim, û ta ez karibim ez ê binivîsim.

Van peyvan bi yek peyîvê binerxî ne?

Jiyan: Divê berxwedan be ta dawî, û xurtir bibe

Jin: Bê jin jiyan nabe, û serketin jî tune

Şoreş: Xaniyeke, divê derî û pencerê wê jî hebin.

Berxwedan: Qelen e.

Maf: Kes bi xêra xwe nade

Helbest: Ciyawaziyêdide xuyakirin,şaristaniyê jî diyar dike.

Muzîk: Du cure hene, jê û pê ve tune ye, kurdî û Ewropî ..

Hûn li ser van kesayetiyan dikarin çi bibêjin?11-

SeydayêCegerxwîn: Helbestvan e, lê Osman digot mukriyanî jê xurtir bû, Cegerxwîn helbest a kurdî nû kir û pêşwaz kir

Konê Reş: Rojekê li ser şehîdan nenivîsand, bo bazirganiyê di hemû warî de dinivîse.

Seydayê Tîrêj: Kurdistan di Berzanî de didît.

Apo Osman Sebrî: Bi rojan zarokê wî birçî diman, şoreşger bû.

Dr.Nûredîn Zaza: Mêr bû. Zanyar bû, kêmasîk wî hebû nêzî began bû

Mihemed Şêxo: Hunermend bû, evîn derdekî mezin e min dabûyê.

Bêbihar: Min gelekî jê hez dikir.

13- We helbest li ser vê şoreşa Sûrî û ya Rojava bi taybet nivîsî ne?

min li ser Kobanî nivîsiye. Berî demekê du mêvanên me hatin, ji Rojhilat bûn, yekî xwe avêt destê min û maç kir û ji min re got helbestên te li çiyayên me navdar û belavkirî ne.

- Hêvî û xwenên te bo avakirina Kurdistanê hene?

Bavkê Muhemed(S) yê pêncan ji Kesra re dibêje: «Kurdo rehmê li me bike, we cîhan girtiye». Ez dibînim roja Kurdan hatiye, divê em ji dest bernedin.

Qewîtiyên mamoste Mihemed Elî Hiso çi ne?

Hêviya min ji ku tu car çavê we neşkê, û tu car ji dijminan bawer nekin. Ji ber bi dehên caran soz dane Apo û derew kirine.

Gotina dawî ji bo rojnameya Bûyerpress û xwendevanê wê?

Ez dibêjim Bûyer gavek mezin avêtiye, hêvî dikim hûn bibin rojnameyeke rojane.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî

Dawiya Plyalê

Hekîm Ehmed

Rojek Bê Wijdan

Di vê rojê civîne Neyarên me seraser
Mirin bo me danîne diz û ewbaş û berber
Ew in tevde bê cî ne dixwazin me bikin der
Xuyane qey birçîne dane di çol û şevder
Ji (Dewr û Gera Kurdistanê) ya Mela Ehmedê Palo.

Rojek Bê Wijdan: Careke din mijareke klasîk e, ku bêbextiya demê yek ji baweriyên ku bûne bingeh ji bo ramana civaka Kurd. Helbet, li ba hemû gelan bûyerên nexweş hene lê ne li asta ku dem yan felek bê wijdan be, ne weke di civaka me de ku hevokên (Felekê xayinê, zemanekî bêbext e) bûne gotinine rojane.

Di vê rojê civîne: Kirar (kirde) di vê hevokê de ne diyar e bi awayê ku pirsekê li ba xwêner peyda bike (Ew kî ne civîne?), tekez, ew ne Kurd in, ji ber ev xewna helbestevan û dilêşên welat tucaran pêk nehatiye. Mela Ehmedê Palo maf dide xwe weke helbestevan ku rêzikeke ziman pêk neyîne, ew jî êxistina paşdaçekê ji hevokê ji bo sazkirina terazûya malikê.

Neyarên me seraser: Kirarê ku dereng ma bû, eşkere dibe, civîn a neyaran e, zelal e ku neyar ne hew dijmin in lê ew hemû xêrnexwaz û dijber in. Cînava (me) dihêle ku (ez)a helbestevan di nav (em)a gel de bihele û bi hemû hest û ramanên xwe bibe berdevkê vî gelî, ji ber pilan ne li ser kesayetiya wî ye, lê li ser tevaya gel e, ji hêleke din ve (seraser) pirbûn hevbeşiya neyaran û dorpêça wan tekez dike.

Mirin bo me danîne: Dîsan jî (me) ango Kurd tê weke tewera vê civînê, lê berî wê ferman û biryara civînê (mirin) aniye ziman. Lêkera (danîne) di gelekjimarê de hatiye, ev careke din tekez dike ku biryar bi erêkirina tevaya civînê hatiye dan.

Diz û ewbaş û berber: Di danasîna Mele Palo de neyar ev in, cureyê yekê diz in, ji bo pere û berjewendiyên nerewa li dijî gelê Kurd in, ê didiwê ewbaş in, bi nezanî pîs in û metirsî ji van ji yê pêşîn ne kêmtir e, neyarê sêyem ji Kurdan re berber in, hov û kujer û wêrankar in, jiyana xwe di kuştin û tawanê de dibînin.

Ew in tevde bê cî ne: Çawa? Ma mirov bê cî û bê welat hene?. Helbet na, lê girêdana mirov bi warekî ve pesnek e, xeyseteke erênî ye, prensîpeke mirovane ye, ji ber wê helbestevan vê taybetiya mirovî nade wan, wan dibîne weke mar û dirindeyan bêcî. Belê seyda, bi xwedê ev ne mirov in, ev weke tu dibêjî hov in.

Dixwazin me bikin der: Erê fermana mirinê bo me derketiye, lê mebest û daxwaz ku me bikin der, ji welat û doz û mafên xwe dûr bibin, ev e rastiya pilana ku palo eşkere dike.

Xuyane qey birçîne: Wêne zelaltir dibe ku seyda wan hov dibîne, ji ber mirovê birçî hêjayî dilovaniyê ye, dirindeyê birçî cihê tirs û metirsiyê ye, eva dawî mebesta helbestê ye.

Mane di çol û şevder: Çiqas rewşa hov xirab bibe, ewqas metirsiya wî pir dibe, hovên bê cî, birçî, li çolê û şevder, ew in yên ku li hev dicivin û fermana mirinê bo me derdixin.

Dewlemendê

Imran mentesh

Cîhan tev de l› min rabe te bernadim
Bo çavê te Şêrînê ez Ferhad im
Tu gul û Nesrîn û Nêrgiza min î
Doza te dikim her bi qîr û firyad im
Rûkê te pir spî ye mîna berfê
Çav beleke por tarî ye wek şevê
Ji dilê min qet carek dernakevê
Bi evînê te sotime hilandim
Her ez doza te dikim ta bighên hev
Li ser çiyan wek pilingan têm bi rev
L› te digerim her çax û dem, roj û şev
Bi vê ger û hatinê ez dilşad im
Cana min tu her şêrîna vî dil î
Bo çi nayê carek din wek ewilî !
Piştî wan çavên du reş dêmê gulî
Li vê jînê bê hêvî û mirad im

Cana min dewlemende mal mezin e
Xemla wê yaqût û zîv û mircan e
Pir xweşik e ciwan e Kurdistan e
Bi gorî bim ez pêşmergê li qad im

1993

..Biratî



Cemîl Dahir

Biratî ka çima her dem bi ceng in em li hember
Hev bira zane em yek dê û bav in lê çima bûn wek gura
Vaye xwezya min bi rojên koçberî ceng û $era
Vaye xwezya min bi zilma wan neyar û gawira
Tim ez birçî û mişext bim wer li çola nav gira
Na ku ez eşqî me her dem kole jîn bim lê bera
Da ji nanê xwe bidî min, ji cilê min wergira
Da bi kêşa min bibarîn rondikan û hêsira
Bo bihestin wek berê ez, tu bi ew hestê bira
Carinan ez pir dixwzim hin li min din wek berê
Ta ku hawara te bê rizgar bikî min wek berê
Ma tu zanî ka çima her ev çiya wer bûne
Berz hevdû hilgirtine ji bingeh dest di hev de
Nabe derz dar ku çendî wa bilind bî Şax pelandîne
Li hev reh dema li Şaxa dinêrin xwe dipêçin
Ew li hev roj û Şev çendî cûda ne qet demê naxwin ji hev.
Roj li havînan dirêjin lê zivistanan bi $ev
_
Ka çima em her wihane tim li hember hev bi gef
Bo neyaran kêf û şahî lê didin dahol û def

Pî ne pê ye

Mehfûzê mele silêman M.Reşîd

Xar xistin berê kaniya
Bi xar avêtin kaniya
Man xar keçikê kaniya
Ev şîn û ser ji bo çi ye?
Ku ser çû nig li ber çi ye!
Ger ser bêşê zik birçî ye
Kalîtî her ji banî ye
Kalîtî ji bin banî ye
Kelêtî ji dest kebanî ye
Çimikê çê, ka bi çi ye?
Çendî çê dibe li çiya!
Çem çem e, ma çemik çi ye?
Berçemok çile ne çile
Pî ne pê ye, bi xwe mile
Esmid kil e , dew bi kil e
Bayê ji Bakur tê kure
Bê bisk û kezî por kur e
Çi pis ,çi jî law her ku re

Destkevt bere, gule bere
Herê bere, sing jî bere
Anî bere , kevir bere
Birîn û kovan jî kul e
Jan êş e , derd jî kul e
Çîk pirîsk e, qepal kule

Daçeka xwestinê ka ye
Êm ê sewalan jî ka ye
Malbat in jî hene kaye
Tendirust û sax rehet e
Bi lez û zû jî rehet e
Xweş û hesanî rehet e
Xem jî xem e, hemû yek e
Kat jî dem e,wate yek e
Kêm keme, êk jî yek e
Here biçe, kevir kuçe
Soht qiçqiçe, na jî nice
Hindik piçe, lîk jî vice
Piçûk kiçe, dire diçe
Dengê şikestinê qirçe
Dengê werbûnê jî irçe
Goşa teng û tarî qunce
Dawiya çixarê jî qunce
Pijkoja kulîlkê xunce
Pova hûr û nerm pirçe
Dengê maçkirinê mirçe

Ji tebakên zîrek hirçe
Çak , ciwn û rind: qence
Xort ,ciwan û law: gence
Nazik û tenik , lar û lence
Azar û zînat iskence
Pûçker û hişbir bence
Barkêşî zehmet û renc e
Balindê bê qidoş kunde
Rûn başe di hîz û kunde
Lêvegera bajêr gunde
Rêzan û rênas rêbere
Sertaş û porbir berbere
Hevseng û hempa hember

Hişk û çirk û çiten qurse
Cefil û bizdandin tirse
Bêje û ştexalî pirse
Şor û wişe herdû peyvin
Mang û meh herdû heyvin
Her demsalek jî çar heyvin
Birîn û dev di axivin
Lebat û leq herdû livin
Ker û ker ne wek hevin
Ziman tîp û kitê devin
Gotin ji wan derdikevin
Kurd jî bi wan di axivin
dawî

PENABER

Salih Jango

Dema Dayik Rondikên xwe
Di Landika Hêvîyan de dilorînin
Û li ber bayê Payîza welat
Xewnên xwe didêrin û dibarînin…!
Wê çaxê evîna te …
Di dilê min de hişyar dibe
Û ez li ber Pêlên lehiya hêsirên dayikan bê Serî diçim
Welatê min...
Îro ji te dûr im
Weke Çûkekî çengokirî di Zivistaneke tarî de
Bê Hêlîn mame…!
Lê ez bûme şivanek li ber xewnên vegera xwe
Li himêza axa te de
Ew axa ku xewnên pakrewanan himêz dike…!
Ew xewnên ku di Landika şiyariya xwe de wan dilorînim
Û bi germiya dilopên xwîna xwe wan diparêzim
Ji qirra tenêbûnê…!
aaax …
Ji vê tenêbûnê …
Dema Perda tarîya xwe bi ser jiyana min de diweşîne
Asoyên hebûna min wenda dibin
Sînor li Jiyana min teng dibin
Û riya min di laşê min de namîne
Wê çaxê qîrîna min di gewya min de bê deng dibe
Lê vedenga qîrîna birînên pakrewanan
Û lorîna dayîkan
Bi ser darbestên zarokan ê ku bûne nîşana welatê min…!
dîsa min hişyar dikin û berê min didin evîna te
Welatê min….
Hey welatê di cenga xurtan de Îro maye bê serî
Gelo…ma rojek heye ku li te vegerim û tu bûbî bi seriy…?

Ez Tim Heme

Nûşîn Bêcirmanî

Ez padişahê xewn û ramanê te me
Gul pişkivî, îro li ser lêvê te me
Sînor herin, çiya herin, ez her heme
Çerx û felek tev ser tene, hey dilberê
Bayê evînê hate min, sermest kirim
Bejna te min pîva bi çav, dil dîl e tim
Agir dihat cerg û hinav, bê hêz kirim
Gera cîhanê bo te ye, hey meygerê
Sînga te xewna min civand roja bedew
Baxê te tim war e ji bo bilbil û kew
Bayê te hûnik tim dihat, ez ketme xew
Ronî te da, rengê te wek qozaqerê

Pora te reş bû wek şevê, sewdan firand
Rûyê te wek roja hilatî, şev çirand
Tîra ku hatî vî dilî, hêz zû şikand

Ev çûn û hatin bo te ye, lêv şekirê
Cîhan hemî wênek ji nav dêmên te ye
Kulîlk di nav de sor û zer rengê te ye
Yezdan çi dabû, gul jî tim rengê te ye
Pûç e pîlana şevê, wê zû herê

Cûdî û Hemrîn dil revandin vê şevê
Namek ji lêvê hate min, min zû divê
Tim şiyar im bendî te me, nakim revê
Ez tim heme, naçim ji jînê, kî werê!!

Hîn Lîstok Dide Girî

Carina dibeze.. carina jî, bi paş ve dizêvire. Ji bang û qêrîna wî zimanê bangan lal dibû. Wî nizanî çi bûye, ne jî zanî kî maye..!!?

Li pêş malên bêderî, û ji hilma birînên teze pelên darçinarê xwîn digriyan. Rehên dara Yasemînê li beden û şaxên xwe digeriyan.

Di navîna erd û zemîn de, dûmaneke xalîkî çavên demê kor kiribûn.

Diket.. radibû.. carina jî, li solên xwe yên nîvşewitî vedilukimî, lê tirs ji wî direviya û her li ber xwe dida, ku kesekî bibîne, û ji wî bizanibe, ku çi çê bûye..!?

Vedengên nalenalan, sîmfoniya giriyê şîrmijan û axînên nîvqurçî neynika aso tîk dikirin.

Ne berbang bû.. Ne sibe bû.. Na na; ne roj bû jî.

Hemû tişt li dervî sînorên demê li xwe digeriyan.

Hin dîwarên hilweşî bûn, û hin jî nîvherifî bûn. Lê gilîzê hovîtiyê ji wan dadiwerivî.

Dimeşî.. ew ne li riyan digeriya.

Diket.. ew ne lawaz û bêvîn bû, lê her tiştek ne wek xwe bû, ne jî reşikên cavên wî ti wêne werdigirtin. Tenê.. tevliheviyê carina ew bi paş ve dizêvirand.

Wî destê çepê dikir rêberê zikxuşka xwe, lê ji nişkê ve, lîstokekê destê wî rawestand.

Ji wê bû, ku tiliyên çarsalî ne, û li wê digerin.

Wî bi hêdîka lîstok ber ve xwe kişand, û bi coş maç kir.

Ji wê maçkirinê lêvên wî sor bûn, û ziman şor bû.

Fêrmiskan lêv şuştin, lê zimanê wî zêdetir şor kirin.

Hêze xwe kir, ku rabe ser xwe, lê ew bi ser laşê kalemêrek de, ku bedena wî bibû nexşeyek ji xwînê ket. Axîneke giran û nalînek bi êş perda guhên wî hejandin.

Wî ji kalemêr pirs kir: Çi çê bûye?

Kalemêr bi dengekî giran got: Ev taxa me ye. Ev mala me bû. Ez li hevjîna xwe Gulê û li keça xwe Rewşena çarsalî digerim, belkî ew jî li min digerin, û belkî lîstoka Rewşenê jî, li me hersiyan digere...!!

Dema kalemêr wisa got.

Şiyêr bi hemî hêza dengê xwe bang kir..

Bavooooooo bavo!!!!! Di bextê te de me; bavo...!!

Bêje min kanî dayka dilovan?

Kanî Rewşena biçûk....???

- Loooo Şiyarê min. Ev tu yî ?

- Bavooooooo bavo.. !! Kanî Rewşena biçûk ???

- Şiyarê min. Ev tu yî ?? Mala Xwedê ava be, ku tu hîn heyî.

Şiyarê min! Ka ez te ramûsim. Ez te maç bikim.

Ez te hembêz bikim, ez ji dîtina te têr bibim.

Wî lêvên xwe yên dilovan dan ser dêmên Şiyêr, lê mixabin, ew tî miçiqîn û Şiyarê çardehsalî li ser sîngê bavê xwe bîr ve çû...!!

Û hîn lîstoka Rewşenê, ji bo wan dide girî..!!

Merwan Berekat

Derew

Bavpîrên me ji berê de gotine (çi derewên wek rastan), ango derew derew in, lê hin kes derewan dikin, ku mirov têkeve baweriyê de, kesê derewîn derewekê amade dike û ji deh kesên rastîgo re dibêje û her weha li pir deveran belav dibe, daku xwediyê ewê derewê yê resen wenda dibe û ew derew dibe gunehê yekî ji wanên rastîgo, weke ku ji berê de jî hatiye gotin: Tira xwe dixine stuwê havalan.

Derew jî mîna hemû tiştên evê jiyana derewîn -xwedê giravî- pîtoliyek jê re heye, di evî biwarî de,derew jî rengareng in û curbecur in, derewên biçûk(hûr), derewên mezin(girs), derewên kesk, derewên sor, derewên zer û....h..w.. d.. û bi rastî kirî min ji bîr bikira .., ên spî (gewr) jî hene.. xwedê kirî ku hate bîra min, Ji xwe ev derew a girîng e. mirovan dixapîne(ku ez dîtim ez im.. û ku ez nedîtim diz im..), ku bawerî pê hat, qenc e.. şahnazî ye.. pesind e, lê ku bawerî pê nehat .. bi zelûlî xwediyê ew ê derewa spî dibêje min henekek kir û te jî da dû -û xwe dikenîne-..ha..ha..ha.., li min megir .. bibûrîn, ma min ji te re, got.. çi zû te jî çû got û belav kir?

Her kesek li gor dilê xwe dire (diçe).., hin di rastiyê de, mijûl in û hin jî rahênana çewtiyê dikin, gelo ew ê li dawiyê bi ser bikeve kîjane?..Di nav me de.. û di ev ê demê de, ew ê çewt be..an na?

Her ku ronahî nêz dibe siya me re mezintir dibe, lê ku me re derewîn be, ew ê derewên me re jî mezintir û pirtir bibin, çiku bawerî bi me re bêhtir têt, lewra em ê jî, biçirrînin, ka kî ye ew ê ku di ber re, bigihêje û bidirû?.

Ew kesên ku tinaziyan bi çavên xelkê dikin, hingî li pê û lingê xwe dinêrin û nikarin serê xwe mîna dilêran hildin, çavên xwe naxin çavên mirovan, çi fedî be û çi tirs be, ew serpêl in ;çiku ew xwedanên tawanêd giran in, lê ku em li derewînên xwe xwedî dernekevin û wan fedîkar û şermezar nekin, tew tu kesên dîtir îştera xwe ji wan nayinin (ku em bi kêrî xwe neyên tu kes bi kêrî me nayê), ku çûk li ser darê dimire û ji ser darê tête xwar .. zîmara derûna xwe nake ...!!

Ku tirs nebe hezkirin jî tune ye, ango kesê ku nizanibe bitirse, nikare hezê jî bike.., dêmek ku em li saxlemiya tenduristiya civaka xwe ne miqate bin û em tep, rîp û derewan binuxêmin û veşêrin, em ê poşman bin, çiku em ji civaka xwe hez nakin, daku em lê jî ne miqate ne.

Daku em jiyana xwe kedî bikin, pêdivêye ku em li payiza xwe jî rawestin, ne tenê li buharê , erê buhar xweş e lê payiz wê dadiweşîne, weke çawa ku havîn û zivistan û buhara jiyanê heye . her weha payiza jiyanê jî heye, - belê ez benî - ka kî ji me heye; ew ê jiyanê ram û kedî dike û li temenê civakê dibanîne?.. Ka kî ye ew ê ku derewan jê diqewrîne(diqewtîne)? Bila serê xwe mîna mêran hilde û çavên xwe di çavên min xîne û bê tinazî bila bibêje dijminê derewan ez im, ku kes nebe gazina me jî namîne , de bila payiza sar û sermeyan pelên dar û kulîlkên jiyana me biweşîne. biweşîne..!!!

Dîsa em ê vegerin gotinên bav û kalan, dema ku ne ji valahiyekê gotine:

« Tiştê ku çavan vediwesîne xew e .. û tiştê ku kela dilan di germa havînê de, hênik dike ..dew e.. û tiştê ku mirovan li her cîh û deman çirrûk dike.. derew e».

balo ê ku dijminê gellê xwe ye kew e,û a ku talaniya civaka me ye derew e ... !

Hokirin xebateke berdewam e, lewra hokar pê ve girêdayî ye, lê ew suxte an şagirtê bêyî hoker(nîr).. û bêyî hokar (mamoste).. jirêder e, tûle ye, çiku ne di rêzikê de ye, û endamên civakê tev hişmend in .. û ew tenê şêt û dîn e, lê na ne weha ye, çima ne ew tenê hişmend e, çiku ew tenê ne derewîn e .. çima û ji bo çi ..?

An zagoneke xureristê(sirûştê) heye û yasa da ye, ku piraniyê mêranî daniye, balo em di dema berovajî û dernexûm(derniqot) de ne, û ev şêwe jî şerm e û kirêt e û fedî ye, raserî ji derewê re ye, mixabin...!?

Min veşêrin ji çavên birçiyan
Min veşêrin ji setema çiyan
Min veşêrin di himbêzên xwe de
Min veşêrin ji havîn û germê
Min veşêrin ji çille û sermê

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer press
Nûçe...Bi Zelalî

Arşek Baravî-Amûdê

Min veşêrin di paxilên xwe de
Min veşêrin ji dîtina jaran
Min veşêrin ji çewtan, ji xwaran
Min veşêrin di reş çavên xwe de
Min veşêrin ji gurên devbixwîn
Min veşêrin ji kesên derewîn
Min veşêrin di hinavên xwe de
Min veşêrin ji silava pîsan
Min veşêrin bo nebînim dîsan
Min veşêrin di ramanê xwe de

Ev çi dema têvel û qetirme ye, em li diyarde û dîmenan miqate ne û me hinav û hundirê derûna wan jibîr kirine, ên ne li henkûfên navdariyê .. navdar bûne, hin dewlemendên navdariya qenciyê ne û hin jî xoşewîst in, diravgehên bayikên wan ava ne ,lê bi rastî rûxsarên derewgehên wan berz û şityar û xuyanî ne, peyker û kelex û pûte jî, zor qeşengin, lê ku zir (tirole - sexte) bin û efsaneyî û şaristanî ji wan bêpar bin, kî gunehkar e, zirkar an dîrok an gell? Na em gunehkar in, çiku zirkarî jî, pêmaya derewên me ye.

Li dawî ez ê diyariyekê bikim perû û xelat: Ez dil û canê xwe dikim diyarî jib bo ewan kesên xwedanêd baweriyê, ku hewildan û xebat û kêferatê dikin, daku mezintirîn xewn pêk bînin, çiku ew ne derewîn in?

Hevpeyîvînek Taybet bi Dilşad Ebdo re Endamê Komela Xwendevanên Kurd



Di serî de bi navê rojnameya «Bûyerpress» em spasiya vê derfeta han dikin.

Helbet ez jî di wê şanaziyê de me ku hûn mihvanê min in, û ji rojnameya we re serkeftinê dixwazim.

Xebat û bizava we çawa di nav xwendekaran de despê kir?

Min li zanîngeha Helebê dixwend, û ji ber ku rewşa xwendekarên Kurd li wir xerab bû, me çend xwendekaran xwest ku em tevgerekê ji bo xwendekarên kurdan çê bikin, ta ku em alîkariya wan bikin û pêdiviyên wan li gor karîna xwe pêk bînin.

Ji me re li ser damezrandina Komelê biaxive?

Di despêkê de em çend xort û keç tenê bûn, me li amojgeha yasayî dixwend, ew jî di sala ۲۰۰۹ an de bû, me hin çalakî dikirin, wek alîkariya xwendekaran a diravî li gor karîna me, korsê Zimanê kurdî, semînarên çand û hunerî, wisa me karê xwe bi dizî dikir ji ber rewşa awleyî pir zor bû, êdî hejmara hevalên me dibûn gelek, me karê xwe kir birêxistinî di bin navê **«komela Xwendevanên Kurd»** . Di serê şoreşa Sûriyê de yekser me Komelaya xwe ragihand û dirûşma me (Çand, Zanîn, Perwerde)

Ji bilî xwendevanên Kurd, we têkilî bi xwendevanên Kurd re dikirin?

Di despêkê de wek kesayetî me têkilî girê didan, lê piştî ragihandina Komeleya me, me êdî têkilî bi hin dezgehên xwendekaran re dikirn wek» Rêxistina xwendekarên Asûrî».

Wek xwendekar hûn çawa rewşa Rojavayê Kurdistanê dişopînin?

«Xwendevan afrênerê şaristaniyê ne, û şaristanî bê kesayetiya serbixwe ava nabe»

Em xwe dibînin neviyên Celadet,Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, û Tîrêj, ên ku bandora wan li ronakbîriya tevayî Kurdistanê hebû, ketine bin bandora raman û baweriyên kesin ji bilî xwe, û ji dervî Rojavayê Kurdistanê, di gel rêzgirtina me ji tevan re, lê Rojava bûye meydana nakokiyên wan ku me dixwest meydana lihevkirina wan be, kurdperwerî parastina berjewendiyên milet e, ne parastina berjewendiyên partîtî ne.

Em bi hêvî ne ku rêkeftina Dihokê têkeve xizmeta gelê me li Rojavayê Kurdistanê de, û nebe alîgira windabûna kesayetiya meyî Rojavayî.

Û di dawiyê de spasiyek taybet bo rojnameya **«Bûyerpress»** û hemû karmendên wê re, ku heta niha ew yekemîn rojnameya serbixwe di Rojavayê kurdistanê de tê nasîn. Her serkeftî bin.

Ji Bo Evînê û Bajarê Evînê Helbest Hatin Xwendin

Li bajarê Qamişlo û di bi navnîşana ku « Sala nû ji evînê re ye» Û « Ji bo Evîn veger bajarê Evînê» şeveke helbestî hat lidarxisin.

Ev şev ne wek hemû şevbuhêrkên helbestî amede bû û qediya, yakemîn car ku şevbuhêrkek helbestî li çayxaneyê çêdibe, û tê de mihvan li ser maseyên xwe rûniştin, qehwe û çaya xwe vedixwarin û li helbestan jî guhdar dikirn. Dîse ne wek her car ku yê helbestvan li pişt masê rûdinişt û helbest dixwendin, vê carê helbestvan mihvanê mihvanê xwe bûn, di şevbuhêrkê de pênc helbestvan beşdar bûbûn ew jî ev bûn: Ferhadê Içmo, Xunav Kano, Ehmed bavê Alan, Hekîm Ehmed, Ciwan Nebî.

Helbest ligel muzîkê dihatin xwendin wisa kirasê helbestê rengîn dibû bi muzîka muzîkjen û hunermendên ku alîkar bûn di vê şevbuhêrkê de, ew jî ev bûn: Muzîkjen û hunermend Şivan Temo, hunermend Ciwan Cemîl, û sazjena kemanê Rewa Qadir Egîd.

Şevbuhêrk bi awayekî reht û xweş derbas bû Rojnameya «Bûyerpress» hin axftinên lezgîn standin

Ferhadê Içmo dibêje:» Bi rastî neku ez beşdar bûme wiha dibêjim, lê ev şev wê bimîne şevek taybet di dilê min de, ji ber ku me dikarî hemû tiştan di vê şevê de biguherin, û helbesta evînê ji bajarê evînê re bixwînin, û helbet ji bo evîn li bajarê me veger weke berê.»

Hekîm Ehmed got:» Ez wek helbesvan ku beşdarî vê şevê bûm, bi rastî matmayî mam, ji ber ku em fêrî ku cemawer rêzkirî bin û em jî li pişt maseyê bin û helbestan bixweînin, vê şevê ew bingih şikand, û helbet şev ji bo evînê û bajarê evînê bû loma pir dilşad bûm ku min helbest di vê şevê de xwendin.»

Hêjayî gotinê ye ku ev şev li Qehwexaniya «Kobanî» hat lidar xistin, û wek ku Xwedanê wê Birêz Dîno dibêje: «Ez û qehwexaniya xwe di xizmeta çand û wêjeya kurdî de ne.»

Vejîna 110 Salan Ji Rojbûna Serok û Tekoşerê Kurd Apo Osman Sebrî

Li navenda Celadet Bedirxan a partiya Çapa Dîmuqartî Kurdî Li Sûriya, semînarek ji bo vejîna **110** salan li ser rojbûna Serok û nivîskar û tekoşerê Kurd Apo Osman Sebrî lidar ket.

Di despêkê de birêz Winda Şêxo serkirdeya di partiya Çapa Dîmuqartî Kurdî Li Sûriya de bixêrhatina hemû mihvanên amade kir, û xwesteka rawstandinekî li ser canê pakrewanan kir, êdî mihvanê xwe pêşkêş kirin ew jî ev bûn: Nivîskar konê Reş, lêkolîner Derwêş Derwêş, helbestvan Deham Hesen û Siyasetmedarê Kurd û serokê partiya Çapa Dîmuqartî Kurdî Li Sûriya Salih Gedo.

Semînar bi Nivîskar konê Reş destpê kir, di axeftina xwe de ew li ser jiyan û serpêhatiyê Apo Osman Sebrî axivî, û bala mihvanan kişand ku gelek tişt di jiyana vî lehengî de hebûn ku gelek kesan nedzanîn, paşê lêkolînerê navdar Derwêşê Derwêş li ser Apo Osman Sebrî wek nivîskar bêtir li ser jiyana wî ya wêjeyî , nivsî, helbest û gotarên wî axivî, êdî rê dan helbestvan Deham Hesen ku ew hebestekê bi zimanê Erebî bixwîne. Û berî ku bi dawî bibe rêzdar Salihê Gedo serokê partiya Çapa Dîmuqartî Kurdî Li Sûriya, li ser jiyana Apo Osman a siyasî axivî, û ronî da gelek qonaxên giring di jiyana wî ya siyasî de. Û ji mihvanan jî rê dan Nivîskar Dilawerê Zengê wek kesayetiya herî ku nêzî Apo Osman Sebrî tê naskirin, dilawer jî li ser gelek tiştên giring di jiyana Apo Osman sebrî de axivî.

Xwendekarên Zanîngeha Hesekê Piştgiriya Lêvegra Siyasî Dikin

Li bajarê Hesekê û di navenda Cegerxwîn a çandî de Tevgera Xwendekarên Kurd li zanîngeha Hesekê ahengek ji bo pişgiriya lêvegera siyasî ya kurdî lidar xistin.

Destpêk bi xuleyek bê deng li ser canê pakrewanan bû, êdî Ednan Hisên gotina Tevgera Xwendekarên Kurd li zanîngeha Hesekê xwend û mebesta wan ji vê ahengê tê de diyar kir, û Birêz Xalid Umer gotina YNKS» Şaxê Hesekê» xwend tê de pişgiriya wan kir û doz li xwendekaran kir ku bi rola xwe bilîzin nexasim di vê qonaxa hestiyar de.

Paşê Tevgera Xwendekarên Kurd li zanîngeha Hesekê, hinek ji nivîskar û afrênerê bajarê Hesekê xelat kirin ew jî ji bo ked û rola wan di wêje û civaka kurdî de, yên xelatkirî ev bûn: Hekîmê Revê, Miş›el Osman, Sîpan Fîras, Kovan keleş, Lemiya Keleş, Berşeng Mihemed û tê de rûmeta endametiyê diyarî hunermend Me›sûm Şikakî kirin.

Û di dawiya vê ahengê de hunermend Şikakî li gel hunermendê piçûk Mihemed Miş›el Osman gelek stran gotin û şahiyek xweş li wir bi hev re qedandin.

Ji bo Şengal û Kobanê Matşek Fotbolê Li Bajarê Hesekê Lidar Ket

Ji bo piştgiriya berxwedana Koban û Şengal matşek fotbolê li bajarê Hesekê hat lidarxistin bi amedebûna herdû şandeyên ji Encûmana Niştimanî Kurdî li Suriya û ji Tevgera Civaka Demokrat(Tev-Dem) ê, Hevbenda Werzêşvanên Kurd li Suriya xuleya çaran ji fotbolê ya zanîngehan vegerin bi amedebûna gelek cemaweran ji aliyê civakên sîvîl û komîtên qutabiyan. Herwiha hemû zanîngeh tê de beşdar bûn. Bi gotina Encûmna Niştimanî û pişt re gotina Tev-demê ahengê despê kir, hêja ye gotinê ku ev lehingiya fotbolê wê li navenda yaneya «Bengo» a sporê li bajarê Hesekê bê lidarxistin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî



Ken û Serkeftin Ji Me Re ye, Ev Der Rojava Ye

«Mêrkil» Xwe Avêt Himêza Serokê Ferensa

Di pêşwazîkirina serokê Ferensa ji bo serokê cîhanî di meşa Yekîtiyê de li Parîsê ku ji bo li dijî terorê bimeşin hatin vexwendin. Serokwezîra Almanya Angela Merke, xemgîne û dixwaze xema serokê Frensa kêmtir bike û xwe avêt himêza wî. Pêşwazîkirina bêhtirî ٥٠ serok û serkirdeyên welatan ji aliyê serokê Frensa Hollande ve li qesra Êlîzê hate kirin.

Kurdî Xweş e

Bedenkirin	هيكلة	Bi ser de girt	اقتحم
Behanekirî	مبرّر	Bicîanîn	تنفيذ
Beloq	شاذّ	Bihintenkir	خانق
Berbijar	مرشّح	Biîşkirin	تشغيل
Bergirî	مناعة	Bijare خيار – اختيار	
Berwerkirin	مقارنة	Binema	مبدأ
Bîner	شاهد		

Mamik ???

- Binî ax e, nîvî şax e, serî zêr e?
- Ez çûm serê banekî, min lexist gopalekî, deng çû welatekî?
- Şaşik li ser sera ye, bang dike, lê ne mela ye?
- Goka minî sor, tê de henin heft çermên spî dor bi dor?
- Binî şîn e, serî spî ye û kulav zêrîn e?

Bersiva Hejmara**10**an: Xew – Kevçî- Kew- Derî

Pend û Şîretên Kurdî

Xwezî mala min li tehtebejê ba, û ne li cem xesiwa min kejê ba
Rehet dibe şûna xencera, lê rehet nabe şûna xebera
Xeber ne derdin , di ber xwe de berdin
Rastî tale , derew şore , bê bextî nayê dqurtandin
Bêbextî û telaq reş, ew nabînin warê xweş

Pantolon ji serkwezîrê Îraqê şemitî

Di dema serdana Enqerê de, serokwezîrê Îraqê Heyder Ebadî, riya xwe di protokolê de şaş kir, serokwezîrê Tirkiyê Ahmet Davutoglu bi milê wî girt û riya rast nîşanî wî da. Piştre gelek caran pantolon ji wî şemitî û di protokolê de, li pêşiya kamerayan pantolonê xwe bi jor de dikişand.

XAÇEREZ

Asoyî:
11 - Paşnavê Baba Tahir
22 - Ji matmayînê (vajî), lawirek.
3 - Ji tirî yan xurman çêdikin (vajî), tersî bej.
4 - avahiyên asê yên mîran, wekhev.
5 - Daçek (vajî), paşnavê hunermendekî ji Qamişlo..
6 - Li ser gorê ye + e.
7 - Paşkîteke gelekjimarê, ramyar pê mijûl dibin
8 - Xwarina sereke, cînaveke nîşankirinê.

Sitûnî:
1 - Evîn.
2 - Navekî pêxember Muhemed.
3 - Daçek (vajî).
4 - Lehengekî cengê kvin.
5 - Jimarek e, lîstikeke zarokan.
6 - Jimarek e, lîstikeke zarokan.
7 - Orta sibeh û êvarê, vexwarina sereke.
8 - Mûyê rû (vajî), rojeke heftiyê.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
			■					■
3					■			
4						■		
5			■					■
6		■					■	
7			■					
8				■		■		

Bersîva Bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	L	É	P	I	N	S	Î	N
2	A	R	Ê	S	E	■	S	Ê
3	I	I	R	K	■	Y	A	R
4	Ê	K	■	F	R	A	■	F
5	N	■	T	N	A	S	E	H
6	Î	W	É	C	■	E	Ş	■
7	■	E	■	E	H	■	Î	N
8	È	D	Î	■	H	Î	R	O